

ez dayîka transseksuelekî ê me



LÎSTAG

Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan

Ji Tirkî: Kawa Nemir



Punto Baskı Çözümleri



ez dayîka
transseksuelekî
ê me

LİSTAG

Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan

Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan

Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan (LİSTAG), ji bo ku piştevanîyê bide malbatên wan kesên LGBTT (Lezbîyen, Gey, Bîseksuel û Transseksuel), bi armanca ku toreke malbatî ava bike, di meha Rêbendanê ya sala 2008'an de hat damezirandin.

LİSTAG'a ku di sêrî de bi beşdarîya çend dayîkên dilxwaz û dilxwazên Lambdaistanbulê civînên hefteyî saz kirin, bi awayekî bi lez û bez mezin bû, di Nîsana 2008'an de hevdîtina xwe ya malbatî ya pêşîn pêk anî û piştî vê hevdîtinê jî, bi şeweyê mehê carekê, bi awayekî bi rêk û pêk bi hevdîtinên xwe yên bi malbatan re berdewam bû.

Van hevdîtinên ku takekesên (dayîk, bav, xwişk û bira, êd.) ên ku hîn bûbin wekî yek ji endamên malbatê hevzayendbaz, bîseksuel, trans û transseksuel e û di vê mijarê de bervekirî ne ku



biaxivin tê de hev û din dibînin, ji alîyekî ve ku derfet çêkirin ku yên hatî bikaribin der heqê mijarê de biaxivin û ezmûnên xwe parî hev bikin, her wisa bûn alîkar da ku di navbera malbatan de peywendîyên germ û nêzîk jî çêbin. Ji milê din ve jî, gelek dilxwazên Lambdaistanbulê jî, yên ku nû behsa rewşa xwe kiribin yan jî hizir dikirin ku bikin, bi xêra van dîdarîyan şansê wan çêbû ku bikaribin bi dayîk û/yan jî bavên hinekên din re bipeyivin.

Dayîk û bavên dilxwaz ên ku beşdarî xebatên Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan bûn, piştî van gihînekan, bi armanca ku xwe bigihînin dayîk û bavên din, bi çapemenîyê re têkilî danîn û gelek çavpêketin kirin û nivîs nivîsîn. Bo bangên alîkarî-piştevanîyê yên hatî bo xeta rawêjkarîyê yan jî qûtîya posteyê ya Lambdaistanbulê ezmûnên xwe û pêzanînên xwe veguhestin.

Ev pirtûkçeya di destê we de xwe dispêre çîroka dayîka transseksuelekî ya dilxwaza LISTAG'ê û hatîye amadekirin ji bo ku bibe alîkar bi wan malbatan re, yên ku yek ji endamên wan trans e. Bê guman ev ê nebe bersiv bo hemû pirsên der barê mijarê de, lêbelê hûn dikarin bi me re têkilîyê daynin, pirsên xwe, pêşniyar û rexneyên xwe ragihînine me. Û helbet jî hûn dikarin tevî me bibin û bibin alîkar da ku em kêşeyên xwe bi hev re çareser bikin.

Heke yê we jî zarokê/a we, xwîşk û birayê we yan jî nêzenasekî/e we hevzayendbaz, bîseksuel yan jî trans be û bi armanca ku hûn bersivan ji pirsên xwe re peyda bikin hûn bixwazin em hev bibînin, hûn dikarin serdana malpera webê ya koma me bikin, pê pirsên xwe ragihînin, hûn dikarin xwe bigihînin bêtir zanyarîyan, beşdarî dîdarîyên me bibin û tevkarîyê li xebatên me bikin.

Em li bendê ne we jî di nava xwe de bibînin.
LİSTAG Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan

Ez çawa dikarim xwe bigîjînim LİSTAG'ê?

Bi rêya bloga me:

<http://listag.wordpress.com>

Bi rêya xeta me ya rawêjkarîyê:

Hûn dikarin têlefônî Xeta Rawêjkarîyê ya LİSTAG'ê (0531 467 77 53) bikin, cî û saeta hevdiîtina me hûn bibin,
yan jî

bi rêya navnîşana me ya e-posteyê:

hûn dikarin e-posteyê bişînin ser navnîşana contactlistag@gmail.com û rasterast bi me re têkilîyê daynin.



Benim Çocuğum

bir aile filmi

SURELA FILM İZLEMEK "BENİM ÇOCUĞUM" İZLENİMLERİNİZİ BELLEĞİZE KAYDOLUN CAM CANDAN
ÖMER CEYLAN ŞULE CEYLAN GÜNSELİ DUM PINAR ÖZER SEMA YAKAR NILGÜL YALÇINOĞLU ZEKI YALÇINOĞLU
DURUKAN YÖNETMENİ ÖĞÜZ YENEN YOLU ÖĞÜNÇ HATİPOĞLU KURSU GÖKÇE İNCE SAĞDINCİ YÖNETMENİ BOYSAN YAKAR
DİZAYN SAĞDINCİ H. METEHAN ÖZKAN YAPIMCIYLA CAN CANDAN, AYŞE ÇETİNBAS, GÖKÇE İNCE MAYIS AYI 2013

SURELA
FILM



www.benimcocugumbelgeseli.com

Îhtimaleke xurt e ku hûn vê pirtûkçeyê dixwînin ji bo ku berîya niha bi demeke kurt yek ji kesên ku hûn jê hez dikin ji we re daye xuyakirin ku pênasa wî/ê ya zayendî û zayenda wî/ê ya bîyolojîk/bedenî li hev nake û li gel hev nagunce. Bextê we çê ye ku we ev pirtûkçe ji xwe re bi dest xistîye. Qey çima? Dema ku min gavên pêşîn davêtin, dema ku di hişê min de bi hezaran pirs hebûn û dema ku ez tûşî şokên pêşîn dibûm, ez tenê û nezan bûm. Ez dixwazim hûn bizanibin ku hûn ne tenê ne. Ez dayîka transseksuelekî me û min xwest ku ez çîroka xwe ji we re gilî bikim. Ez bawer im gelek tiştên hevbeş hene, yê ku hatine serê min û we.

Di sala 2006'an de ez hîn bûm ku zarokê min transseksuel e. Lê min pê nizanibû bê ka transseksuelî çî ye, ji çî diqewime û berpirsiyarê/a wê kî ye. Ez dayîkek bûm, a ku pê nizanibû bê ka ew ê di kîjan qonaxan re derbas bibûya. Pirsên pêşî hatî bîra min ev bûn: “Raşehitîbûn e?”, “Gelo tişteke hat serê wî?”, “Xwezîya xwe bi yekî anî?”, “Gîyannexweş e?”, “Gelo şîzofren e?” Ji ber van hemû pirsên min jimartî û yê wek wan di nava diltirsî û taswasan de fetisîm û di vê rewşa xwe de vegevîzîm hey vegevîzîm.



Zanyarî hêz e. Guh bidine kesê/a ku hûn jê hez dikin û xwe perwerde bikin. Hûn der barê çîrok û ezmûnên curecur ên kesên xwedîyên pênasa zayendî ya cuda û kesên derbasî zayendekê dîtir bûyî de çi qasî bibin xwedîyê/ya zanyarîyên zêde, dê ew qasî pêkan bibe ku hûn wê hezkirin û piştevanîyê bidin, a ku dê bibe alîkar ku kesê/a ku hûn jê hez dikin bi jîyana tendurist berdewam bibe.

Min çi qasî zanyarî ji xwe re bi dest xist, ez çi qasî hîn bûm, ez bi wî qasî bûm dayîka transseksuelekî ya alî xwe û zarokê xwe kir, piştevanî dayê û hezkirina bê şert û merc hîn bû.

Di heyama min a berexêrbûnê de, piştî emelîyatên mêjî yên min derbas kirî, zarokê min hat ba min û tiştê gote min, ku pergala zanîna min ser û binî hev kir, tiştêkî diwartir ji yeka ku ez nizanibim bi tiştên ku qaşo min dizanibû û ew fam dikirin, diwartir ji emelîyatê, diwartir ji cudabûna ji hevserê xwe, diwartir ji peydakirina kar, diwartir ji astengên di dûmahîya temenê min de gelek caran derketî pêşîya min: “Dayê, yê min gîyanê min tiştêk e, bedena min tiştêkî din e,” wî got, ez tê negihiştim. Min li çavên wî nihêrî weku bibêjim, “Wateya ji vê çi ye?”, dîsa ez tê negihiştim. Min pirsî wekî, “Tiştêkî çawa ye?” Wî got, “A rast ez keç im, bedena min a mêran e.”

Ez di cî de sar bûm, şaşomaşo bûm, şeqizîm. Bo demeke dirêj em bê deng man. Ez ponijîm. Min gote xwe, “Yan vî fam nekîr bê ka qonaxa balixbûnê çî ye yan jî ev bû yekî gîyannexweş.” Min dilmînî da xwe. Her çawa bûya, min ji her tiştî re çare didît. Min gote xwe, ez ê ji vê yekê re jî bibînim û min bêdengî xera kir. Min got, “Dergûşa min, delalê min, tu mereqê meke, serê xwe pê meêşîne, em ê çareyekê jê re bikin.” Bi gotinê min got, lê hişê min çelq bû, kizînî ji kezeba min çû, rêyeke tarî dirêj bû li ber min. Ez wisa di cî de ji xwe re mam.

Ez pirr li ber ketim, kurê min hişê xwe avêtibû. Naxêr, naxêr, ew di çaxa balixbûnê de bû! Jê nehatibûye ku derbasbûnê fam bike. Naxêr, naxêr, gîyannexweş bû! Ez li hev qelibîm. Ne tişteki wisa bû, ku mirov bikaribûya li cem hinekan gilî bikira. Wekî din jî, çenedibû ku min derdê xwe jî ji hinekan re bigota, ji bo ku wê zarokê min navno bikirana. Ez li van tiştan difikirîm. Ji alîyekî ve jî ez li ber înternetê rûniştim, min dest pê kir li psîkiyaterekî gerîyam. Min şeweyekî tîmarkirinê yê bêderman xwest, li gora xwe min peyda kir jî... Di vê navê de min dest pê kir gote zarokê xwe, “Binêr, delalîyê min, ew ê derbas bibe.” Wî bi pêdagirî digot, “Dayê, ev derbas nabe, ez ji berê û paş de wiha bûm.” “Hey wax!” min got. Min di dilê xwe de digot, “Tu nebê nexweşîya vî hebûye, min pê dernexistîye, xerab lê anîye.”



Hestên we, pirsên we, tirsên we, diltirsî û şayîşên we hûn heta bixwazin girîng in. Ev pirtûkçe xizmeta çavkanîbûnê dike ji bo ku beşek ji van bên çibicîkirin.


Di vê navê de zarokê min kete odeya xwe, nema jê derket. Bû yekî lap bihêrs, êrîşkar, xeydok û xwe kerr kir. Bo du salan her roj li Stenbolê em çûne ser psîkiyatran. Ez di nava tengasîyên aborîyî û manewî de bûm, lê hê jî min nekarîbû çareyekê ji derdê xwe re peyda bikim. Dawîyê min psîkiyatrekî jêhatî peyda kir, dibêjim, jêhatî, ji ber ku wî ez û zarokê min arasteyî Peymangeha Bijîşkîyê ya Çapayê kirin. Min hîç nebihîstibû ku di zankoyan de beşek heye, ya ku li gel rewşên bi vî cureyî peywendîdar dibin. Me jivan girt û em çûn. Jixwe beriya wê hingê jî birrek testên wî hatibûne kirin. Wate, gava ku hûn dibêjin, “Ez ê bibim mêr,” yan jî “Ez ê bibim jin,” hûn bi dest xwe

re nabin. Birrek test têne kirin. A pêşîn testa IQ'yê.


Bijîşkê zarokê min hilda odeya xwe ya di nexweşxaneyê de, xêlekê peyivîn, paşê wê gazî min kir. Wê got, “Peywendîdarî zarokê xwe, ji vir, ji min tu hêvîya çî dikî? Çima tu hatî?” Min got, “Ez li bendê me ku zelalîya rewşa zarokê xwe hîn bibim û derbasî pejirandinê bibim.” Wê zarokê min derxiste derve. Wê got, “Zarokê te transseksuel e, derbasî pejirandinê bibe.” “Lêbelê!”, min got. Min dilê xwe bi xwe şewitand wekî, “Mamoste, lawik pîrr bi waswas e, lê mamoste ev anoreksîya ye, lê mamoste, wilo, lê mamoste, wisa...” Bijîşkê pirsî, “Gelo ez bibêjim, ew gîyannexweş e, tu dixwazî vê bibihîzî?” Min got, “Erê!” Wê got, “Naxêr.” Got, “Ne gîyannexweş e.” “Mamoste, tawanbar kî ye? Min di kû de şaşî kir? Qey min ew şaş mezin kir?!” Ez li pey hev û bi helkehelk dipeyivîm. Prof. Dr. Şahika Yükselê bi tenê bi hevokekê ji min re got; got, “Hin zarok wiha ji dayîk dibin.” Min got, “Baş e!” û ez ji odeyê derketim.

Min tişteke bi zarokê xwe neda hisandin. Çîpên min dilerizîn. Lerzê bi min girtibû, ez diligligîm. Min hest bi xwe kir ku ez zehf neçar im. Piştî ku min zarokê xwe û kekê wî şande malê, ez di hewşa nexweşxaneyê de li ser bankekê rûniştim û min dest bi girî kir. Ez bi borreberr girîyam. Ez bi dilşewatî girîyam. Min kurê xwe winda kir, min zarokekî xwe





winda kir, ez li ser wê yekê zehf girîyam. Paşê girîyê min sekinî. Xuya bû wekî tiştên bijîşkê gotî kartêkertir bûbûn ji tiştên ku heta wê hingê zarokê min ji min re gotibûn. Wate, rewş hatibû destnîşankirin. Va ye, wê hingê keça min ji dawa min ket. Erê, erê, keçeke min hate dinyayê. Xwe jî keçeke min a terrikî ya 15 salî çêbû. Min qonaxa pejirandinê da destpêkirin. Wate ji vê malbata min bû, hevalên min, karê min, cîranên min, taxa min, dibistana wê, karê wê û jîyana wê... Di pencereya hemû kesan re min nihêrî li keça xwe ya di 15 salîya xwe de hatî dinyayê. Of! Vê yekê mirov pirr diwestand, pirr tarî bû. Ez derbasî ber pencereya xwe bûm û min li keça xwe nihêrî. Ez tirsîyam. Çawa min ê bikaribûya vê pitikê mezin bikim?



Lê pêşî diviya min xwe agahdar bikira û vekolan bikirana ji bo ku ewleda min, pitika min a ku min dikaribû bi dil û can xwe gorî bikirayê di dûmahîya jîyana xwe de bi awayekî tendurist, bextewar û ewle bijîya, ji bo ku bikaribûya li ser pêyên xwe bisekinîya, ji bo ku bixwenda. Ji bo zaroka xwe min ê ne bi dilekî, lê bi heft dilan bikira, ji ber ku wê ez nexapandim. Wê dizî nekir, kes nekuşt. Bêrêzî li ti kesî nekir. Wê bi duristî got, “Dayê, alî min bike.” Wê qûtîya dilê xwe ji min re vekir. Wê qala hestên xwe, tiştên ku wê hest dikirin kir. Xwe veneşart. Eşkerebûna zaroka min hêz li hêza min zêde kir.



Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan (LİSTAG) komek e, ya ku wê di vê heyama nedîyarîyê de alîkarîyê bi we re bike ku hûn rêya xwe derxin û ew ê di zanyarî, pêşnîyar û parîhevkerinên rast de li gel we be. Gelek dayîk û bav ji rewşa we fam dikin û ezmûnên xwe bi par ve dikin.

Yê min der heqê mijarê de zanîna min qet tunebû. Min dest pê kir lê kola... Paşê min û endamên Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan me hev nas kir. Ê wan ezmûna wan ji ya min zêdetir bû. Ew dayîk û bav bûn, ên ku ji hev re bûbûne piştevan û bi vê yekê zora xemên xwe, diltirsîyên xwe û nezanîna xwe biribûn.

Li cem wan min hest bi xwe nekir ku ez tenê me. Êdî ez ê bibûma pal û pişt li zaroka xwe û li hemû zarokên ku ev hest bi wan re hene. Te dî gotin çendî hêsan e, ne wisa? Pêkanîn û sepandin zehmet e. Lê heke behs behsa zaroka we be, hem zehmet e, hem jî ne zehmet e...

Zaroka we vê heyama têr zehmet pirr tenê dibihurîne heta ku ew ji we re qala rewşa dike. Ew hewil dide ku xwe veşêre; ji ber ku, hizir dike, gava ku civat tê derxe, dê erza wî/ê bê şikênandin û tûştî tundûtûjîyê bê. Ev veşartî pêkutîyeke ku bi salan berdewam bibe pêk tîne li ser kesê/a ku hûn jê hez dikin. Eger hat û bi xwe re li hev be jî, çêdibe ku şopên vê pêkutîyê di jîyana wî/ê civakî de bo demeke dirêj kartêker bin. Tew dem û dezgehên civakî yên wek malbat, dîn, rewîşt û gerdîşe van pêkutîyan zêde dikin. Ev sedem dikin ku kesê/a ku hûn jê hez dikin xwe kerr bike.

Ji bîr nekin; şok û fikarên ku vê gavê bi we re peyda bûne di temenekî xwe yê pirr biçûk de bi wî/ê kesî/ê re peyda bûbû, ku hê wê hingê ezmûna wî/ê ya li ser jîyanê pirr kêmbû. Dema ku îcar kêşeyên ku ew ji ber cudatîya xwe dijîya jî li arîşeyên balixîyê yên heyî zêde bûn, tenêtîya wî/ê car bi car zêde bû. Ez tê gihîştim ku tiştê pêşîn ê ku bihata kirin ew bû wekî min piştevanî lê bikira da ku ew bigihîsta bedena ku wê hest pê dikir. Cil û bergên wê, navê wê, rûçikê wê û ta dawîyê.

Dibe ku carcaran hûn jî bi guheranên navgotî yên bi kesê/a ku hûn jê hez dikin re peyda bûyî dihisin yan jî hûn pê hisîyan û îhtimal e jî ku we ew di ser guhê xwe re avêtin. Hûn dikarin moletê bidin xwe û şînê

bigerînin wekî kesê/a ku hûn jê hez dikin pênasana xwe ya bîyolojîk wînda kirîye.

Heke kesê/a ku hûn jê hez dikin bibîne ku guhê we li ser wî/ê ye û hûn ê wî/ê bi her halê wî/ê ve pê qayîl bibin, ew ê xweşhal bibe. Lêbelê, heke hûn zêde dest tê wer din, dibe ku ev yek bike ew helwestinan bigire, yên ku hûn ne li bendê bin, û ew hê bêtir xwe kerr bike. Ku hûn hevdiînan bi malbatên heman qonax jîyayî re bikin, ev ê bibe alîkar ku hûn vê qonaxê bi hêsanî derbas bikin.

Ji ber ku çîroka her takekesekî/e transseksuel cihêreng e, pêdivî bi navberê û demê heye da ku hûn dîyar bikin bê ka kesê/a ku hûn jê hez dikin dixwaze çawa bijî û pênasana xwe ya zayendî çawa derbibirre.

Tiştê ku em dixwazin li vir jê behs bikin guheran in, ên peywendîdarî pênasana ku ew xwe pê terîf dike – zanava wî/ê ye. Mînak, bikaranîna nav, rengdêr û bernavên ku (her wekî keça min, kurê min) kesê/a ku hûn jê hez dikin çêtir digirin ku bi kar



bînin ji gavên pêşîn in, ên ku dê kesê/a ku hûn jê hez dikin zehf bextewar bikin.

Di vê yekê de gelek erkên me dayîk û bavan hene. Malbatên ku zarokên xwe red dikin û nifiran li wan dikin ji xwe direvin û ji ber derdorê nikarin bên rûbarî xwe. Reftarên civakê yên li hemberî zarokên me yên ku bi pênaseke zayendî ya cuda dijîn tijî pêşdarazî

ne. Lêbelê hizra min ew e ku pênasa zayendî parçeyekî pênasa takekesî/ê ye, yê ku naguhere û çênabe ku bê guherandin, li şûna ku kes bi hewildaneke bêhûde xwe bide zorê da ku xwe li gel civakê biguncîne, divê hewil bide ku bergeha civakê biguherîne. Ji vê re jî piştevanîya dayîk û bavan divê. Jîyan pirr kurt e, bihêlin, ew çi dibin bila, ew ê çawa bextewar bibin, wisa, bila mirov bi beralîbûna xwe ya zayendî şa bibin, bi tenduristî, bi bextewarî û bisteh bijîn.

Em xwedîtîyê li zarokên xwe bikin. Em nebêjin, “Wê xelk çi bibêje?” û bi vê xwe û zarokên xwe danavî û canzerî nekin. Em bîrewer bin. Em bi zarokên xwe re bipeyivin. Me divê bipeyivin; ji ber ku min bawer e ya rast raşehitbûn li dû veşartinê û taloqdanê pêk tê.

Keça min dibistana amadeyî (lîse) kuta kir. Di pola duduyan a zankoyê de kete ser kurm û kirasê xwe,

malbata xwe, civakê, dibistana xwe, rûçikê xwe, navê xwe, derdora xwe û hevalên xwe û gihişte pênasa xwe ya rasteqîn.

Dema ku cara pêşîn wê ji min re qala rewşa xwe kir, tiştê ku wê wek “Dayê, bedena min cuda ye, gîyanê min cuda ye” derbirrî, me bêahengî bi hev re kir aheng.


Transseksuelî çi ye:

TRANS bi Latînî tê wateya “ji vê û bi wê de” yan jî li “hember”.

Pênasa zayendî ew hest e, ku kes hest bi xwe dike wekî ‘jin’ yan jî ‘mêr’ û dibêje xwe, ‘ez jin im’ yan jî ‘ez mêr im’. Pênasa zayendî peywendîdarî wê yekê ye, ku kes bûnewera xwebûnê ya di dilê xwe de wek mêr, jin yan jî bi awayekî din terîf bike û hest bike.

Terîfkirina **Zayenda Bîyolojîk** ew yek e, piştî ku zarok ji dêya xwe dibe, gava ku bijîşk li lebatê zayendî yê zarokî/ê dinihêre û bêyî ku cî ji nedîyarîyê re bihêle, bibêje, “ev keç e” yan jî “ev kur e”. Em dayîk û bav jî vî/ê zarokî/ê wekî endamekî/e koma zayendî ya hatî terîfkirin xwedî dikin / em hizir dikin ku em ê xwedî bikin.





Lê di rewşa transseksuelîyê de pênasaya zayendî ya kesî/ê û zayenda wî/ê ya bîyolojîk li hev narikibin û pîrî caran kes hest bi pêdivîya desttêwerdana bijîşkî (ya hormonal yan jî neştergerî) dike da ku bikaribe vê bêahengîyê ji navê rake. Bo nimûne, kesin hene, ku ji jidayîkbûna xwe ve wekî jin ji dayîk dibin û xwe wekî mêr terfî dikin, yan jî kesek wekî mêr ji dayîk dibe û xwe wekî jin terfî dike. Ev kes bi awayekî **devkî** yan jî **bê gotin** (bi ser û sîng, zimanê bedenê, por, aksesuwar û hwd.) derdibirrin ku bedena wan nagunce li gel pênasaya wan a rasteqîn.

Sedemeke dîyar a transseksuelîyê tune

Lêkolanan pêkerên civakî, bîyolojîk û derûnî vekolane. Lêbelê bi tena serê xwe teorîyek tune, ya ku ji aliyê civaka zanistê ve bi gelemperî bête pejirandin. Hin zarok wiha ji dayîk dibin û wiha dimirin. Sedem her çî dibe bila be, girîng e ku hûn bibin piştevan bo kesê/a ku hûn jê hez dikin.



Çima nikare wek berê bimîne û divê biguhere?

Tiştê ku divê hûn bînin bîra xwe ew e ku Pênasa Zayendî ya kesê/a ku hûn jê hez dikin û Pênasa wî/ê ya Bîyolojîk/Bedenî naçin ber hev.

Bêhna we fireh bikin, dem divê ji bo ku hûn bipejirînin; girîng e ku hûn hestên xwe bi keys bikin, ên ku çêdibe di demên cihêreng de dijraberî hev bin û hişê we tevî hev bikin.

Çêdibe ku hûn bi vê yekê diêşin, ditirsin, tûşî şokê hatine, xwe û hinekên din tawanbar dikin û vê rewşê înkâr dikin. Zanyarîyên rast dê bihêlin ku hûn bêtir hest bi dilrihetîyê bikin û bi xêra vê yekê hûn ê bikaribin bi hêsanîtir xwe bigihînin kesê/a ku hûn jê hez dikin û piştevanîyê lê bikin. Reng e ku hevokeke sihêl a wek “Her çî be, ne xem e, ez ji te hez dikim” jî bibe xala destpêkê ya ku lêkhatina we geş bike.

Takekesên ku malbatên wan xwedîtîyê li wan nakin, wan heramoyî dikin, tenê dihêlin, tune dihesibînin hê bi hêsanîtir tûşî bûyerên tundûtûjîyê tên û hê bi hêsanîtir dikevîne rewşên wek fuhûş û xwekuştinê.

Ku hûn dest hilînin û xwe bigihînin zanyarîya pêbawer da ku hûn xwe pê perwerde bikin, dê ev yek bibe alîkar ku hûn xemên xwe û diltirsîyên xwe ji navê hilînin.

Hûn ne berpirsîyar in:

Kes pê nizane bê çima kesek pêdivîyê bi derbasbûna ji zayendekê bo zayendekê din, ya ku di nava gel de wekî guherandina zayendê jî tê zanîn, dibîne, yan jî bê çima ew kes xwedîyê/a beralîbûna zayendî ya cuda ye. Ti delîlek nîne, yê ku bikaribe nîşan bide wekî helwestên dayîk û bavan rê li transseksuelîyê vedikin. Hûn ne berpirsîyar in û ya jê girîngtir jî ew e ku bi kesê/a ku hûn jê hez dikin re rewşeke çewt nîne. Tiştê girîng ew e ku kesê/a ku hûn jê hez dikin bi qasî ku ji we re qala rastîyêke bi têra xwe bingeîn bike bi we ewle ye, wekî bê ka bi xwe çî kes e, û pêwîstîya wî/ê bi piştevanîya we heye da ku bi pêş ve biçê.

Ne nexweşîyek e.

Bêahengîya di navbera pênasa zayendî û zayenda bîyolojîk/bedenî de ne tiştêkî di destê me de ye û em ne berpirsîyar in ji sedemên afirîşê yan jî bê ka çawa perisîye. Hevzayendbazî di sala 1973'yan de ji alîyê APA'yê (Yekîtiya Psîkiyatîyê ya Emerîkan) û di 1990'î de ji alîyê WHO (Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê) ve ji nava dabeşandinên psîkiyatîk hatîye derxistin û hevzayendbazî nema wekî nexweşîyekê hatîye dîtin. Vê rûdawê best li çalakên trans ên ji gelek welatan jî

rakirîye û ew hewil didin ku transseksuelîya ku di psîkiyatîrîyê de wekî “xerabebûna pênasaya zayendî” tê terîfkirin ji nava dabeşandinên psîkiyatîk bê derxistin. Transseksuelî xerabebûna derûnî yan jî nexweşîyeke hişî nîn e. Her wisa xerabebûneke bîyolojîk, hormonal yan jî fizîkî jî nîn e.

Xwezîpêanîn nîn e / “Zarok e, wê derbas bibe”

Ne ji ber ku mirovek kesê/a ku ew jê hez dike ji xwe re dike nimûne, lê ji ber ku xwe li gel wê zayendê hevçeşn dibîne, rola aydî wê pênasaya zayendê dihebîne.

Ne raşehitîbûn e.

Di dîrokê de jî hebû, hê jî heye. Şêweyekî bûnewerê ye. Em wiha dihizirin ji ber ku li derî qalibên ji me ve nas e û doktrînên dînî û çandî dibêjinê, “raşehitîbûn e”. Hizra me ew e ku “Ji alîyê civakê ve nayê pejirandin.” Lêbelê tam berevajî wê yekê, dema ku hinek wî/ê kesî/ê didine zorê ku bi reftara xwe ve bibe kesekî/e ku bi xwe ne ew kes be, zehmettir e ku ew kes xwe li jîyana civakê bîne.



Gelo yekî/ê tişteki xerab anî sêrî?

Li ser pênasaya wî/ê ya zayendî û/yan jî li ser beralîbûna wî/ê ya zayendî ne dîyarker e ku mirov di zarokatîya xwe yan jî hê paşê tûşî tacîza zayendî û/yan jî sivirandinê hatibe yan jî qet tûşî tişteki bi vî rengî nehatibe. Dibe ku kesê/a ku hûn jê hez dikin di zarokatîya xwe de yan jî di demeke nêzîk de tûşî tacîzê û/yan jî sivirandinê hatibe û vê rûdanê bi xwe re encamin anîbin, ên her wekî dibe ku bi wî/ê re rûxaneke derûnî û/yan jî trawma çêkiribe û ew zehmetîyê bikişîne ku bawerîya xwe bi kesan bîne, dûrî têkilîya zayendî be yan jî hin reftarên zayendî yê xeternak pê re hebin. Lêbelê ev rûdan ti carî nikare bi tena serê xwe pênasaya zayendî û/yan jî beralîbûna wî/ê ya zayendî dîyar bike. Heke tacîz û/yan jî sivirandin bibûya sedema guheranên pênasaya zayendî û/yan jî beralîbûna zayendî yê bi vî rengî, çendî jî bête veşartin jî, di civaka me de, di kîjanê de tacîz û/yan jî sivirandin bi vî çendî berbelav e, em ê rastî bêtir takekesên hevzayendbaz, bîseksuel yan jî transseksuel bihatana.

Nezanî

Pênasaya zayendî ji beralîbûna zayendî ciyawaztir e. Beralîbûna zayendî taybetîyeke kesî/ê ye, ya ku li gorî wê zayendê tê terîfkirin, bo kîjanê ew kes bi awayekî zayendî û dilnî berê xwe dide. Heke peywendîyê bi takekesekî/e ji zayenda dij bike, wekî heteroseksuel; heke peywendîyê bi takekesekî/e hevzayendê/a xwe bike, wekî hevzayendbaz; heke ew dikare peywendîyê bi takekesên ji her du zayendan jî bike, wekî bîseksuel tê terîfkirin. Pênasaya zayendî jî ew e ku kes wekî 'jin' yan jî 'mêr' hest bi xwe bike û xwe wisa terîf bike. Wate, ne peywendîdarî wê yekê ye bê ka dilê wî/ê

kîjan zayendê dixwaze, lê ji binî ve dupatkirin e, ya ku ew li ser taybetîyeke xweserî xwe dike. Pênasa zayendî peywendîdarî wê yekê ye ku kes bûnewera xwebûnê ya di dilê xwe de wekî mêr, mê yan jî bi awayekî dîtir terîf bike û hest bi wê bike. Pênasa zayendî peywendîdarî xwebûna kesî/ê bi xwe ye, beralîbûna zayendî jî peywendîdarî wê yekê ye bê ka ew dil berdide kê.

Ne şert e ku di temenekî berwext de bête derberrîn: Çêdibe ku beşek ji wan hê lap bi biçûkanî di pêdivîyên xwe yên bo derbasbûna ser zayendeke dîtir derxin û belî bikin, yên din jî heta ku bibin gewrelaw û gewrekeç yan jî bi têra xwe di nava salan re biçin, dibe ku qala pêdivîyên xwe nekin. **Ji bo derbasbûna ji zayendekê ser zayendeke din tek rêyeke rast tune.**

Em pêşnîyar dikin ku hûn li filîma bi navê **Transgender Temelleri** (Bingehên Transgenderê) temaşe bikin, a ku li ser pênasa zayendî û transseksuelîyê ye, kurt e, 20 xulekî ye û bi jêrnivîsa bi Tirkî ye. Hûn dikarin li ser înternetê, li ser vê lînkê li vê filîmê temaşe bikin: <http://listag.wordpress.com/videolar/>

Sedemên bertekên dayîk û bavan

Ji ber ku ji jidayîkbûna wan û bi vir ve ye bi wan re ne, dayîk û bav hizir dikin ku bi xwe zarokên xwe zehf baş nas dikin, tew jî vê yekê bawer in. Berteka gelemperî ya ku ji ber cudatîya bi zarokên wan re bi dayîk û bavan re peyda dibe, yên ku ji binî ve ji vê yekê re ne amade ne, ji şok, matmayîn, tirs û şermê pêk tê.



Hin endamên malbatê xwe tawanbar dikin, hizir dikin wekî “Min di kû de şaşî kir?” Ew rewş ne berhema serketîbûn yan jî serneketîbûna we ye; pênasa zayendî bi her kesekî/ê re bi şêweyekî serbixwe diperise.

“Wê xelk û alem çî bibêje”

“Em ê ji xelkê re çî bibêjin?”, “Ew ê çî bifikirin?”, “Gelo ji ber tiştên kesê/a ku em jê hez dikin kirî dê statûya me ya civakî û şêweyê jîyana me biguhere?” Heke hûn ji dayîk û bavên, endamên malbatan û hevalên tiştên wek van ezmûn kirî re qala van pirs û xemên xwe bikin, dibe ku ev yek pîr hêja be. LÎSTAG (Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT’yan) komek e, ya ku hatîye damezirandin da ku di van hemû qonaxa de hevkarîyê bi we re bike.

Divê hûn ji bîr nekin ku bertekên pêşîn ên ku hûn nîşanî kesê/a ku hûn jê hez dikin bidin girîng in, ji ber ku ew ê peywendîya we ya di dahatûyê de ya li gel wî/ê dîyar bikin. Hewil bidin ku hestên xwe yê nêyînîtir ên wek hêrsbûn, bawernekirin, şok yan jî

şikestina xeyalan bi koma xwe ya piştevanîyê re bi par ve bikin, di kîjanê de hûn ê bikaribin wan hestên xwe bi awayekî ewletir derbibirrin. Pêbawerîya erênî û cîyê dilsozîyê ya ku hûn bi xwe bikaribin bidin peyda bikin. Reng e ku hevokeke sivik a wek “Her çi be, ne xem e, ez ji te hez dikim” jî bibe xala destpêkê ya ku lêkhatina we geş bike.

“Ew zerarê dide bedena xwe ya tendurist” “Tu ne ew mirov î, yê/a ku min nas dikir”

Kêlîya ku kesê/a raza xwe eşkere kirî bikaribe tişteki ku di nava salan re di dilê xwe de xweyî kiribe dawîya dawî bibêje, dê dilê wî/ê bi awayekî ji awayan rihet bibe. Bê guman ew ê bixwaze ji we re qala hemû pêzanîna xwe bike û bê guman jî hûn ê bixwazin ku der heqê vî warî de, yê ku hûn nas nakin û peywendîdarî wî/ê kesî/a ji we ve nas e, bi hemû hûrgilîyan ve hîn bibin. Tiştê ku hewce dike di vê xalê de mirov hay jê hebe ew e ku lewane ye ku kesê/a raza xwe ji we re eşkere kirî carinan pêdivîyê bi dem û cîgehê aydî xwe bibîne. Ji ber taswasên xwe warê wî/ê yê xwemalî têk nedin.

Pêşdarazîyên dînî û nexweşbînî

Heke hûn dayîk yan jî bavekî xwedî bawerîyên dînî bin, dibe ku bi we zehmet be wekî tevî van doktrînên dînî hûn fam bikin ku zarokê/a we bibêje wekî wî/ê pênaseke xwe ya zayendî ya cuda heye. Lêbelê di hemû pirtûkên pîroz de şîret û pend tînin kirin ku divê mirov li bûnewerê bi navê mirov bi reftara xwe ve xweşbîn û nefsbîçûk be. Behsa çewtîya havîkirin û darizandinê tê kirin. Tê qalkirin ku ya rast ew e ku mirov pêkhêner û yekpareker be.

Hemû dîn xweşbînî û hezkirinê berz û bilind dizanin. Hezkirin tê digihîje... Hezkirin her tiştê ku can li ber e digire nava xwe, fireh dike... Di nava kesên transseksuel de jî gelek mirovên bawermend hene. Ne ji mafê me ye jî ku em bidarizînin bê ka bawerîya kê ji ya kê xurttir yan jî qelstir e.

Behskirina transseksuelîya xwe ji hinekên din re: Eşkerekirina raza xwe

Kesê/a ku hûn jê hez dikin bi peyvên xwe ji we re derbirrîbû ku bi xwe transseksuel e. Her kesekî/e ku raza xwe eşkere kiribe li bendê dimîne ku ji wir û pê ve tiştine baş yan jî xerab biqewimin. Ji eşkerekirina raza xwe re qewî zêde wêrekîya dilînî û duristî divê. Ev kêlîyek e, ku kesê/a li ber dilê we ezîz di rewşekê de ye, ku hem bi temamî bêberevanî ye, hem jî bi temamî dabaxa xwe girtîye. Lewma jî, bertekên pêşîn ên ku hûn nîşan bidin dê ji binî ve kartêkê li danûstandina we ya paşê bikin. (Her weku hûn pê berdewam bibin û wekî ‘Keça min’ / ‘kurê min’ deng bikin li kesê/a ku hûn jê hez dikin, ku ev tiştê e hûn hîn bûne bikin, lê îşaretê bi zayendekê dikin, a ku ew hest pê nake.

Ji ber vê yekê, hûn bidin ser rêça wî/ê û biceribînin ku hûn rêzê bigirin li tiştên ku bihêlin dilê wan pê rihettir be. Heke ji we bê, nav û/yan jî rengdêrên wan bi xwe çêtir girtî bi kar bînin. Têgeheke wek awayê rast tune, ya ku pê takekesên transseksuel bîn terîfkirin, ji ber ku her şexsek takekesekî/e serbixwe ye. Lê guhdarî bikin bê ka kesê/a ku hûn jê hez dikin çi dixwaze û çi ji we bê, wê yekê başbaş bikin, ji bo ku hûn rêzê li xwestekên wî/ê bigirin.

Heke hûn kêferata ku hûn bikin da ku ew dest ji wê zayendê bikişîne ji bo wê piştevanîyê bikin, a ku ew ji we bigire da ku jîyanê bi dilê xwe û bi baştirîn awayî ava bike, hûn ê bikaribin tiştêkî bikin, ku hûn pê serfiraz bibin. Kesê/a ku hûn jê hez dikin çi qasî di nava pênasaxwe ya zayendî de were pesendkirin, dê pêkan be ku hûn rûdanên erênî bibînin. Reng e kesê/a ku hûn jê hez dikin hê bêtir diltêr, bextewar û dil î rihet bibe. Ew ê hew bê gav bibe ku bi reftarên xwe ve bibe mirovekî/e ku bi xwe ne ew e.

Gihîneka duyem a eşkerekirina raza xwe: Hûn raza xwe eşkere bikin

Parastina tora piştrastîyê ne erkek e, ku bi tenê bi para we bikeve. Piştevanîya ku hûn lê dikin dê bi heman awayî li we vegere. Dudilîya xwe ya peywendîdarî gava ku hûn li ber in ranin (heke hebe, bikaranîna navê wî/ê yê nû, behskirina ji hevalan re hwd.), vê yekê bi kesê/a raza xwe ji we re eşkere kirî bidin zanîn. Parastina kesê/a ku hûn jê hez dikin şuxulê qonaxekê ye û çêdibe ku piçek wext bigire, ew ê qonaxên xwe yê eşkerekirina raza xwe bidin berçav bikin û li hemberî kesê/a ku piştevanîyê li wan dikin bîrbir û alîkar bin, bila şika we ji vê yekê nebe.



Ji bo dayîk yan jî bavekî yek ji tirsnahtirîn tiştan ew e ku rastî dijwarîyên girîng bê, yên ku zarokê/a wê/î ya transseksuel di dûmahîya temenê xwe de hewil bide ku bibihêre. Dema ku zarokên wan eşkere kirine ku bi xwe transseksuel in, gelek malbatan berê pêşîn bertekên belave yên li jêrê nîşan dane.

- **Tawanbarî:** Ew hizir dikin ku ew bi xwe bûne sedema ku pênasaya zayendê ya zarokên wan cîyawaz bûye ji ber ku bi xwe tiştêkî “şaş” kirine.
- **Tirsa dil:** Tirsa wan ji wê tirsê ye ku zarokên wan tûşî gefa fizîkî bibin ji bo ku pênasaya zayendî ya zarokên wan cîyawaz e û li gorî vê pênasaya zayendî cil û bergan li xwe dike û dijî û hwd.
- **Kovan:** Ew hizir dikin ku dê dahatûya zarokên wan nebe bi awayê ku “ew çaverê û hevî dikin” û dê bi ti awayî nebe, tew ew bi vê yekê dihisin û hest bi windakirinekê dikin.

Bi gelemperî bertekên wan ên pêşîn ji wê yekê dizên, ku dixwazin wî/ê kesî/ê biparêzin, ê/a ku ew bayexê pîr pê didin, dikarin her tiştî bikin da ku ew bi bextewarî û tenduristîya xwe berdewam bibe, her wisa ji tirsê. Zehf xweristî ye ku ew bi wî awayî hest pê bikin û çêdibe ku carinan malbat hest bi pêwîstîyê bikin ku mesafe hebe da ku şînê bigerînin wekî kontrola arasteyî dahatûya zarokên xwe ji dest dabîn.





Pêwîst e ku malbat di mijara destûrdayînê de piştevanîyê li zarokên xwe bikin da ku zarokên wan bi pênasaya zayendî ya ku ew li gel diguncin xwe derbibirrin. Di vê mijarê de, “bê ka çi tişt kurekî dike kur” yan jî “çi tişt keçekê dike keç”, çanda me pirr çewisîner tê xuyanê û her tim rê nade ku zarokek bibe xwe û vê yekê derbibirre. Bi gelemperî gelek kes hene, yên ku bi lebatên zayenda nêr ji dayîk bûne û mêldar in rolên

zayenda jinbûnê li xwe bigirin. Bi gelemperî ev zarok zûtir dest bi terapîyê dikin, ji ber ku rewşek e, ya ku bêtir tê pejirandin, ku kesên bi lebatên zayenda mê ji dayîk bûyî rolên zayenda mêrbûnê li xwe bigirin. Dema ku malbat mesafeya pêwîst dihêlin, zarokên wan tê digihîjin bê ka çawa ew ê bên ser kurm û kirasê xwebûna xwe û dikarin biryarên xwe bigirin çi ka ew ê çawa bijîn. Di vê heyama li ser pif û nîvekî de kesê/a ku hûn jê hez dikin – wekî mexseda ku biçê sêrî – bêtir hest bi pêdivîya bi piştevanîya malbatê û nêzenasan dike. Girîngtirîn mijara ku her zarokî/ê divê bizanibe ew e ku, li cîyekî di kûrayîya dil de, bê gotin û bazar, ew tên hezkirin.

Hevoka ku bi pêş gotina “Wê xelk û alem çî bibêje?” yê ve dubare were gotin, a ku em ê ji bîr nekin, timî em ê dubare ji xwe re bibêjin û dê me xurt bike (ez xwe dispêrime ezmûnên xwe û dibêjim, min bi xêra vê hevokê xwe li ser pêyan girt): **Pênasa zayendî hûrgilîyeke pirr biçûk a pênasa serekî ye. Hê çendik û çend taybetiyên me hene, yên ku em pê dibin em, ne wisa ye? Tiştêkî wisa nîne wekî her dem pirranî mafdar be. Em ji bîr nekin ku kulîlk ji bi hezar û yek rengî ne...**

Burokrasiya di qonaxa guherandina zayendê de

Li Tirkîyeyê pêwîst e ku mirovek di rêzek sepanên burokratîk re derbas bibe da ku li dû guherandina zayendê ew bikaribe beşa zayendê ya di tomara nifûsê de bide guherandin, di hin emeliyatan de (ji bo ku memikan, malzarokê û bizrên zaro bide hildan, vajîna û penîs bide çêkirin) bikaribe sûdê ji mafên xwe yên ewlehîya civakî werbigire.

• Qonaxa bijîşkî

Heke hûn li Stenbolê bin, beşa bijîşkî ya vê qonaxê bi serlêdana we ya li polîklînîkên Şaxa Zanîstê ya Serekî ya Psîkiyatîrîyê ya Peymangeha Bijîşkîyê ya Zankoya Stenbolê ve dest pê dike, lê heke hûn li bajarekî dîtir bin, divê hûn serî li polîklînîkên peywendîdar ên di Klînîkên Psîkiyatîrîyê yên Nexweşxaneyên Perwerdehîyê û Lêkolanê de bidin. Gihîneka pêşîn bi şiklê kontrola polîklînîk a bi kêmanî bi sê yan jî çar seansan, bi gelemperî bi awayê çavpêketinên ji mehê carekê bi rê ve diçe. Piştî hêlsengandinên psîkiyatîrîk û bîrbirîyî yên curecur, terapîya kombendî dest pê dike, ya ku gihîneka duyem e. Terapîya kombendî heyamek e, di kîjanê de kes hem bi takekesî tê hêlsengandin,

hem jî peywendîya wî/ê ya li gel takekesên transseksuel ên din û bijîşkan tê hêlsengandin.

Piştî demeke dîyar a di henga terapîya kombendî de (ev bi gelemperî sal û nîvekî dikişîne, lêbelê piştî ku pispor rewşa wî/ê kesî/ê ya derûnî, reftar û cil û bergên wî/ê vedinihêrin, bala xwe didinê bê ka zayenda ku ew kes hest pê dike li gel rola civakî digunce yan na, dibe ku ew qonax dirêj bibe) wî/ê kesî/ê sewqî beşa endokrînolojîyê ya nexweşxaneyê dikin. Li vir, piştî hûrnihêrinên bîyokîmyayî û hormonal ên curecur, lê tê lêkolan bê ka rewşeke wisa heye yan na, ya ku rê li ber destpêbûna terapîya hormonî bigire. Hê paşê, eger hat û merc guncan bûn, dest bi terapîya hormonal dikin. Di dawîya raçavkirinê de, ya ku hema hema sal û nîvekî dikişîne, dema ku biryar tê girtin ku êdî bo gihîneka raportkirinê amade ne, der barê kesî/ê de dosyekek tê amadekirin. Di pey re jî, li hafa desteyeke ku ji psîkiyatran pêk tê, bi rêya hin pirsên ku bi alîkarîya dosyeya amade kirî tîr pirsikin, wî/ê kesî/ê hildidine hêlsengandinê û bi dû re raporta wî/ê derdikeve.

Bi destûra bo emelîyatê ya kut ê wergirtin ji dadgeha ku ew raport lê tê pêşkêşkirin, kes dikeve emelîyatên bo hildana malzarokê, bizrê zaro û gunikan, bo çêkirina vajînayê yan jî penîs. Di şertên asayî de hewce nake ku raport bête wergirtin da ku memik bi emelîyatê bîr hildan, lêbelê heke dê sazîya ewlehîya civakî mesrefên emelîyatê bike, raport hewce dike.

• Qonaxa hiqûqî

Divê bi raporta ji beşa psîkiyatîrîyê wergirtî ve serlêdan li dadgehê çêbe. Dadgeh, berîya ku destûrê bide da ku emelîyat çêbe, wekî din dadmendekî/ê dişîne nexweşxaneyê da ku dakokîyê lê bike ku ew kes transseksuel e. Di vê gihînekê de zehf girîng e ku parêzer wî/ê kesî/ê agahdar bike bê ka dadgeha ku vê dozê bi rê ve dibe kîjan dadmend şandiye nexweşxaneyê. Li vir bi gelemperî ew ji we dixwazin ku hûn di beşên

peywendîdarî sewqên bo beşên psîkiyatîrîyê, urolojîyê û zarokanînê de muayene bibin. Piştî raportên ku beşên peywendîdar didin, ew kes careke din diçe ber heyetê û raporteke hevbeş tê derxistin. Raporta nexweşxaneyê ya dadmendî ya ku piştî vê gihînekê tê wergirtin digihîje ber destên dadgehê û ji bo emelîyatê biryara pêwîstekî tê girtin.

Dadgeh biryara peywendîdarî transseksuelîyê li gorî hebûn yan jî tunebûna şertên di benda 40. a Qanûna Medenî de heldisengîne. Li gorî vê bendê, pêwîst e ku kes hejdeh salîya xwe temam kiribe û ezeb be. Heke zewicî be, divê hevserê/a xwe berde. Her wiha, raporta desteya tenduristîyê ya fermî divê, ya ku ji nexweşxaneyê perwerdehîyê û lêkolanê tê wergirtin, ku bi belge dike wekî ew kes bi binyata xwe ve transseksuel e, guherandina zayendê ji bo tenduristîya



derûnî jê re bêgavî ye û ew bi şêweyekî berdewam bê par e ji zerengîya zarokçêkirinê.

Bi vî awayî, bi raporta ji beşa psîkîyatîrîyê wergirtî ve serlêdan li dadgehê tê kirin. Ew kes raporta nexweşxaneyê ya dadmendîyê ya ku piştî vê gihînekê tê wergirtin dibe dadgehê û ji bo emelîyatê biryara pêwîstekî tê girtin.



LİSTAG

Koma Stenbolê ya Malbatên LGBT'yan

Xeta Rawêjkarîyê

0531 467 77 53



ԼԻՏԱԳ

Կոմա Տենբոլê Կա Մալբատêն ԼԳԲԴ'Կան